Bi destveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 141
22'ê Tebax a 2010
Buha: 150 Tûmen

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

**Daxuyaniya Hevpar A 9 Partî Û Saziyan Derheq Karesata Netewî A Kuştina Girtiyên Siyasî**
R: 2

# 65 SAL XEBAT DI PÊXEM AZADÎ Û DEMOKRASIYÊ




**25'ê Gelawêja îsal, 65 sal bi ser avabûna PDK Îranê re derbas dibe. Bi vê hilkevtê rêûresmên curbicur li kurdistan û derve de birêveçûn ku li vê hejmara Agirî de rapor û daxuyaniyên taybet bi wê dikevin ber çavên we hêjayan.**

**Rojbûna te pîroz û her li xizmetkirin bi gel û nîştiman de berdewam û temendirêj bî**

**Rûpel 2**

**Pênûsên Xwefiroş Teqe Ji Sembolên Netewî Dikin**

**Rûpel 4**



**Hevpeyvîna Kovara Livîn bi birêz Mistefa Hicrî ...**

**Rûpel 7**



**Dema Biryardanê**

**Arîn**

**Rûpel 9**



**Serhejmariyên Welatekî "Îmam Zemanî"**

**W: Ceifer Mubeşirniya**

# Gaziya Komîsyona Teşkîlata PDKÎ Bo Endamên Partiyê Di Hûndirî Welat De

Endam, alîgir û dostên PDKÎ!

Hûn agahdarin di heyamê du mehên borî de, rejîma Komara Îslamî a Îranê bo têkdan û zirargihandin bi surûşta Kurdistanê li rêya kirêgirtiyên xwe ve dest bi zincîre agirtêberdanekê li daristan û çêrîngerhên Kurdistanê kiriye.

Di beşek ji wan agirberdanan de xelkê zîrek û hişyar ên deverên agirtêbebûyî ew agirane kuntirol kirine û bi wî awayî erkê welatparêziya xwe bi cî gihandin.

Hevalên rêzdar!

Niha ku em bi pêşwaziya bîranîn 65’emîn salvegera avabûna partiya têkoşera xwe ve diçin, me bi hewce zanî ku ew çend rêniwêniyên jêrîn bi we rabigihînin û rica bikin bi başî liberçav bigrin.

**1-** Di birêvebirina çalakiyên agandeyê de li serxwe û bi pîlan bin bo ku dijmin nekare zeferê bi we bibe.

**2-** Di dema agirhilkirinê de, dibe hişyar bin ku agir li wan cihan hilkin ku pirûşkên agir nebine sebebê şewitandina cihekî din lewma di wî warî de başe ku piraniya agirhilkirinên xwe di nav gund û bajaran de hilkin û eger we li ser çiyayan jî agir hilkir, di bilindahiya çiyayan û di wan cihan ku bi kêmî ji daristan û çêrîngehan nizîk be hilkin.

25’ê Gelawêjê ji we û hemû xelkê xebatkare Kurdistanê pîroz be.

**Komîsyona Teşkîlatê**
**20’ê Gelawêja 1389 a Rojî**
**11’ê Tebaxa 2010 a Zayînî**

# Daxuyaniya Hevpar A 9 Partî Û Saziyan Derheq Karesata Netewî A Kuştina Girtiyên Siyasî

Rêxistinên siyasî ên vajokerên vê daxuyaniyê, serbarê bilindragirtina yad û bîranîna hezaran jin û mêrên ku 23 salan berî niha di rojên han de, tenê seba nêrînên xwe yan jî alîgirîkirin ji opozîsyonê bi biryara rasterast ya Xumênî, rêberê Komara Îslamî a Îranê hatin kuştin, li ser vê bawerê ne ku ji bo pêşgirî ji dûbarebûna karesata wek kuştara bikom a girtiyên siyasî ên Îranê di havîna 1367 û îdamên beriya wê, divê hemû şiyan û karîna xwe bikar bînin.

Bûyerên dîrokî ji bo her welatekê mîratekê bi cih dihêlin. Kesên ku niha di Îranê de deîya(îdia) azadî û dadperweriyê dikin, nikarin li hemberî bûyerên dehsalên dawî ên welatê me û rolê xwe bêdeng bin û ji dana zaniyaran derheq cinayetên ku her di destpêka bidestvegirtina desthilatê ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve heya niha bi nîsbet xelkê ve hatine encamdan, xwe biparêzin û bêdeng bin. Xelk, rastiya wan gotinên ku îrorojê ji aliyê her kesekê ve di her pile û payekê de be, bi wan ezmûn û dersên ku wî ji derbazbûyî wergirtine, dixin ber alalîz û nirxandinê. Mirov ne dikare rexne ji wan bûyerên derbazbûyî negire û ne jî dikare wan ji bîr bike.

Em wajokerên wê daxuyaniyê, nemaze li ser vê baweriyê ne ku girîngtirîn ezmûnên bûyerên sê deshsalên derbazbûyî, hewcehiya xebatê ye bona avakirina civakê ku dewletê neçar bi kuntrolkirina metodên tundûtûj bike û tepeserkirina cudabîran bo hertim haşa bike.

Ji şewazên herî zindî û nemirovane, şikandina kesayetiya mirovan, îşkencekirin û îdamkirin e. Komara Îslamî, derbazbûyek reş derheq îşkence û îdamkirina dehanhezar kes ji xelkê Îranê di karnameya xwe de heye. Cencer û şemendefira kuştara Komara Îslamî, bi berdewamî cudahizrên girtî bêrehmane gorî dike û ji bo tirsandina xelkê, bi berdewamî hinek ji girtiyan hukmê îdamê bi ser disepîne.

Yek ji mezintirîn pêla îdaman di dehsalên dawî de, di havîna sala 1367 a Rojî de qewimî. Bi piştgirêdan bi belge, şahid û vekolînên encambûyî, niha êdî serreqtirîn înkarkerên qirkirina girtiyên siyasî ên Îranê di sala 1367 an jî nikarin haşa ji vê yekê bike ku di wan rojan de, hikûmeta Îranê, deste deste girtiyên bêberevan seba nerazîbûn ji hikûmetê yan jî bawerînebûn bi îdeolojiya rejîma desthilatdar bi mirinê mehkûm kirin.

Em ligel bilindragirtina yada cangoriyên wê cinayeta mezin di 22’emîn salroja wê de, li ser vê bewerê ne ku garantiya dubarenebûna wan bûyerên han, di guherîna reftar, hizr, yasa û pêkhateyekê de ye ku bi îşkence û îdamê li hewla rakişandina cudabîran û cihgîrkirina desthilatê di civakê de ne.

Heya îro gellek hewil hatiyedan daku karesata qirkirina hezaran girtiyan sala 1367’an ji aliyê hikûmeta Îslamî û li ser biryara rêberê wê rejîmê, veşartî û li piştperde bimîne û civaka Îranê ji wê cinayeta tirsnak agahdar nebe. Em dixwazin welatê me xwediyê rewşekê be ku têde tu hikûmetek nekare dest bide îşkence û îdamkirina neraziyan. Em ji bo jiholêrakirina hizra jinavbirina cudabîran dixebitin.

Em hemû hêzên siyasî ên Îranê bi pejirandina peymanekê gazî dikin ku tucar rê nede di welatê me de karesatên weke sala 1367’an, û kuştina girtiyên siyasî dubare bibe. Ji bo pêşggirtin ji her terze karesatek wiha di pêşeroja Îranê de, divê îşkence, îdam û girtina kesayetiyên siyasî nemîne. Niha ku berxwedana xelkê Îranê bo azadiyê, yadê goriyên sala 1367ê zindîtir ji her demekê kiriye, baştirîn derfet ji bo berfirehkirina bazneya weha peymanekê ye. Divêt em cencera kuştara Komara Îslamî bisekinînin û ji bo pêşgirtin ji tolhildan û heyfstandina pêtir a hikûmetê û îdama girtiyên ku bi rehîn hatine girtin, rêçareyekê bibînin.

Em şopandina dosyaya 1367 ê, rohnkirina hemû aliyên wê cinayeta dîrokî a Komara Îslamî û sebebkarên wê û pêregihîştin bi doz û dadxwaziya goriyan û paşmayiyên wan goriyan, bi erkê xwe dizanin û ji her pêngavekê ku di vê pêxemê de bê hilgirtin, piştevaniyê dikin. Di wê derheqê de hevdilî û hevkariya hemû azadîxwazên Îranê pêwîstiyek dîrokî ye.

**Yekîtiya Komarîxwazên Îranê**
**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Partiya Demokrat a Xelkê Îranê**
**Partiya Komeleya Kurdistana Îranê**
**“Cebheya Millî a Îranê”**
**Saziya Yekîtiya Fîdayiyên Xelkê Îranê**
**Saziya Fîdayiyên xelkê Îranê“ pirranî”**
**Komîteya hevahengî a Şêwra Demkî a Sosyalîst Çepên Îranê**
**Şêwra Hevahengî a Bizava Komarîxwazên Demokrat û Laîkên Îranê**
**Duşemî 18.05.1389 – 9 .08.2010**

www.arsivakurd.org

# Pênûsên Xwefiroş Teqe Ji Sembolên Netewî Dikin

Xebat û tekoşîna azadîxwazî û netewî a gelê Kurd di hemû beşên Kurdistanê de di qonax û birrgeyên curbicur de derbas bûye û di heyamê 10 salên derbasbûyî de xebata her beşek ji Kurdistanê tevî asteng û pirsgirêkên curbicur berbirû bûye.

Di nava gişt dujmin û neyarên maf û azadiyên gelê Kurd de, rejîmên desthilatdar li Tehranê, rejîma Paşayetî a Pehlewî û rejîma Komara Îslamî, zêdetir ji hemû rejîmên din fend û fêl û pîlanên curbicur dijî netewa Kurd û xebata berheqe wê, çi di Kurdistana Îranê de û çi di beşên din ên Kurdistanê de birêve birine û ji gişt alavên berdest mifah standine daku bizava rizgarîxwazane a gelê Kurd tûşî şikest û hilweşandinê bikin. Her di vê pêxemê de jî ji êrîşên leşkerî, topbaran û gulebarankirina bajar û gundên Kurdistanê ve dest pê kirine û berdewam bûne li ser girtin, îşkencekirin û lidarvekirina xebatkarên Kurd, nemaze li warê çandî û hizrî de bi hemû hêz û şiyana xwe ve hewil dane daku bingeha nasname û xebat û daxwaza netewî a gelê Kurd tevî sistî û lerzînê berbirû bikin.

Di vê pêxemê de li warê êrîşên leşkerî û tepeserkarane û herwiha îşkence û azardana xebatkaran û lidarvekirinên bikom û bitak û darêtina pîlanên hizrî û siyasî li dijî xebata netewa Kurd, rejîma Komara Îslamî beriya gişt rejîmên din e û li dijayetîkirin tevî Kurd û daxwazên berheq ên wê de, ji hemû pîlandarêntin û fend û fêl û tepeseriyekê mifah standiye.

Yek ji siyasetên eşkere û berdewam ku ji aliyê rejîmên hakim li Tehranê ku bi nîsbet xebata rizgarîxwazane a gelê Kurd birêve diçe, bêhurmetîkirin bi sembolên vê xebatê û vê netewê ye û herwiha bona çewaşekirina bingehên nasnameya netewî û hizra azadîxwazane di Kurdistanê de hewil dane. Her di vê pêwendiyê de, di serdemê rejîma Paşayetî de navê kesên weke Reşîd Yasimî û Îsa Pijman, bo xelkê nasiyar e û li serdemê desthilatdariya rejîma Komara Îslamî de jî rûçikên curbicur û kesên bi nav kurdziman hatine perwerde kirin û bi zimanê wan hewil dane ku hem berheqiya xebata netewî û demokratîk a Kurd bibine jêr pirsiyarê û herwiha bi terzên çewaşekarane û xapandin ve bidin xuyakirin ku kesên han nûnerên rastîn ên xelkê Kurdistanê ne û dengên rastbêj ên gelê Kurd in ku pirr hez ji Wîlayeta Feqîh dikin û her terze xebat û berxwedaneke gelê Kurd bi bîyaniyan girê didin.

Di vê warê de kesên weke Îhsan Hûşmend û Îrfan Qaniîferd...hwd û navên curbicur ên din, lê bi naverokek wekhev, pêka ew erkên ku rejîma Komara Îslamî xistiye stûyê wan, yan dilxwazane, bona xwe nizîkkirin ji bargeha Wîlayeta Feqîh, hewil dane dîroka Kurd û Kurdistanê û xebata vê netewê bibin jêr pirsiyarê û di rastî de ew serbazên rejîma Komara Îslamî bûn û dibin û li jêr navê pêdeçûn û nirxandin bi ser dîrokê û di nivîsarên cuda cuda de bêhurmetî bi buha û şanaziyên netewî û demokratîk ên gelê Kurd dikin û berdewam hewil dane bona şikandina sembolên netewî, hebûn û kerameta netewa Kurd hûr û birîndar bikin daku neteweyek bêçare û hiloşayî bixin berdestê axa, serdest û rejîma xwe, heya ku nan û navekê bidest bixin.

Heyamek e ku kesek bi navê Îrfan Qaniîferd, di doma siyaset û rêyên naskirî ên rejîma Îslamî de, bi hemen ziman û metodê mijûlê karê binav lêkolînê ye. Lê di rastî de navbirî mijûlê sîxorîkirin li ser Kurd û xebata wê di gişt beşên Kurdistanê de ye û ji rêya malpera "tabnak" û Muhsin Rezayî, Serokê Civata Diyarîkirina Berjewendiyên Rejîmê, kar ji bo wê civatê dike ku Refsencanî berpirsê wê ye û di malpera "tabnak" a Muhsin Rezayî, kewne berpirsê Sipaha Pasdaran de çendîn nivîsar li dijî xebata Kurd û bona bêhurmetî û sivikatîkirin bi hêma û sembol û tekoşîn û cangoriyên netewa Kurd belav kiriye.



Her weke hate baskirin ev karê Qaniîferd, ne karek teze ye û doma siyasetên pêrewkirî ên neyarên gelê Kurd û nemaze rejîma Komara Îslamî a Îranê ye û ew tenê moreyekî rejîmê ye ku erk pê hatiye spartin û tu tiştek din nine. Lê eva ku di vê navberê û di vê nivîsar û basan de renge heya astekê nû bin! û pîlanên teze ên dujminê gelê Kurd bin, du tişt in:

**Yekem:** Çend salek in ku rejîma Komara Îslamî ji rêya navendên lêkolînî û stratijiyên xwe ve kesên han perwerde dike û bi qewlê wan, evane bi zimanek zanistî diaxivin û bi vê rêkê ve dixwazin kesên sava bilêbînin ku qisên mirovên han zanistî ne û eva niye di zankoyên binav û deng de mijûlê lêkolînan in! Lê naveroka babetên wan bi tewahî dûr e ji zanistîbûnê û bêbelgeyî bi tewahî pêre diyar e. Mirovên han ji bo gotinên xwe tu senend û belgeyek dîrokî a bawerpêkirî nîşan nadin, û ji bo îsbatkiriana tawanbariya goriyan, tenê gotinên dujmin û neyarên Kurdan tînin û vî karî bi karek zanistî û akademîk binav dikin!

Bo mînak axayê Qaniîferd nivîsek di 19.04.2010'a de di malpera "tabnak" de belav kiriye ku di pêşekiya vê malperê de bo babetê, bi rohnî diyar e ku Qaniîferd erk pêhatiye spartin ku li ser Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê tiştek dûr ji rastî û çewaşekarane binivîsîne. Navbirî jî di vê pêwendiyê de ewa ji dest hatibe, kiriye û dîrokek xeyalî û pirr ji nerastî, şaşî, buxtan û bêhurmetîkirin bi Kurd û Partiya Demokrat û Dr. Qasimloyê nemir û şoreşa Kurd di Kurdistana Îraqê û pirraniya Kesayetiyên Kurd amade kiriye û ji zimanê îxanetkar û kesên nenaskirî û çavkaniyên nediyar ve, direvan dike.

**Duyem:** Weke pêvajoya herdemî, vê carê û di vê qonaxê de kesên han cehdê dikin ku ji rêya piştevanîkirin ji kes û aliyekê, êrîşê bikin ser kes û aliyên din û di rastî de ji vê rêyê ve dixwazin dijberî û netebahiyê bixin navbera xebatkar û aliyên çeleng ên Kurd û bi vê metoda nû! dujminatiyê di navbera wan de pêk bînin. Her di vê pêxemê de ye ku kesên weke Qaniîferd, carna piştevanî ji dîroka Kurdistana Îranê dikin û êrîş dikine ser dîroka Kurdistana Îraqê û carek din û bi hêcetek din, berevajî wê riftarê dikin. Carekê bêhurmetiyê bi Pêşewayê nemir û carek din bi Barzaniyê nemir dikin û rêberekî Kurd xwe re dikin çeper û kerb û kîna xwe bi ser Dr. Qasimloyê nemir de dibarînin. Mirovên han kes û aliyan dikin çeper ji xwe re û êrîşê dikine ser kes û aliyên din û siberojê çepera xwe vediguhesin û ji cihek din ve êrîşê dikine ser çepera berê, daku bi vê metodê Kurd û Kurdistanê tûşî nakokiyên û aloziyên siyasî û hizrî bikin û beg û axayên wan jî bêxem birûnên ku kurd berdana canê hevdu.

Ewa ku li dawiyê de hewce ye pêdagirî bi ser de were kirin, eva ye ku xelkê Kurdistanê û hêz û aliyên xebatkar di gişt beşên Kurdistanê de divêt agehdarê siyasetên han û kesên han bin, nemaze kesên ku ji aliyê dezgehên sîxorî ên rejîmê ve tên rênimayî û rêberîkirin û armanca wan tenê pêkanîna nakokî di navbera xebatkar û azadîxwazên kurd de ye. Nemaze rêberên siyasî ku nabe derfetê bidin kesên wisa ku dixwazin xwe nêzîkê wan bikin û di nava wan de bona îsbatkirina nerastiyên xwe mifahên nebicî bistînin. Kesên han ger bi navê zanistîbûn û azadiya ramanê û rexnegirtinê ve karên han dikin, divê zêdetir agehdarê wan bin û meydana siyasî a Kurdistanê derfeta karên han ên çewaşekarane nede wan. Çimku azadiya hizr û raman û rexnegirtin, pirensîpeke herdemî a xebata azadîxwazane a Kurdistanê bûye û tekez li ser de tê kirin û her di vê pêxemê de jî rexnegirtin bi aramanca hînbûn û dubare nekirina şaşiyan di dîroka Kurdistana Îranê de pirensîpeke cihgir bûye û berdewam e. Şehîd Dr. Qasimlo bi terzek zanistî û dirust û rexnegirane, dîroka Komara Kurdistanê bas kiriye û kêmasiyên wê jî destnîşan kiriye. Lê rexneya dirust û di pêxema baştirkirin û nehiştina kêmasiyan tevî çewaşekarî û anîna belge û dukomentên nerast bi armanca bêhurmetîkirin bi neteweyekê û dîroka wê, du tiştên cuda ji hev in û cudahiya wan bi qasî kêra nojdarî û neştergeriyê û xencera ku ji piştve ji aliyê neyar û dujminan ve tê weşandin e.

**Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**
**Ragihandin**
**15.08.2010**
**24'ê Gelawêja 1389**

www.arsivakurdi.org

Hevpeyvina kovara Livîn ligel Sekreterê Giştî ê PDK Îranê

# Mistefa Hicrî: Niha Komara Îslamî a Îranê pêtir ji her demekê di nav kirîzan de ye

Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di hevdîtinek taybet bi kovara Livîn re, bas ji rewşa niha a Îranê dike û amaje bi rola opozîsyona Îranê dike û di vê qonaxê de navhatî jê waye ku dibe nizîkbûnek pêtir di navbera hêzên opozîsyonê de hebe, bona wê ku bikarin bi bernameyek hevpar kar bikin.



**Livîn: Dîtin û nêrîna we li ser doza Kurd û metodên çareseriya wê çiye?**

**Mistefa Hicrî**: Doza kurd bigiştî li vê qonaxê de rastî guhertinên pozetîv li gor serdemê xwe yê berê hatiye, lê ev guhertinane di Kurdistana parçe parçekirî de ji welatêkê ve bo welatek din bi ferq e.

Li Turkiyê ku hem di warê coxafiyayî ve û hem di warê nifûs ve, zêdetirîn Kurd têde akincî ne, he ji niha ve vebûna demokarasiyê ji gişt welatên din ên ku Kurd têde akincî ne, zêdetir tê berçav û ev pêvajoya ber bi pêş diçe. Partiyên Kemalîstî û hêza leşkerî a desthilatdar ku kospa sereke li hember geşekirina demokrasî û mafê Kurd û netewên din ên welatê Tirkiyê bûn, lawaz bûne û ne xwediyê rola xwe a berê ne. Hinek ji pirensîpên demokrasiyê rê ji bo Kurdên vî welatî xweş kiriye daku bikaribin çalakiyên xwe ên sivîl birêve bibin û jî vê rêyê ve daxwazên xwe bînin berbas. Eva jî di halekê de ye ku di Îran û Sûriyê de derfetek weha ji bo Kurdan tune.

Li Sûriyê Partiya Beis a desthilatdar bawerî bi mafê netewa Kurd nine û tu derfetek bona tekoşîna siyasî a Kurdan nîne. Li Îranê de jî rejîma Îranê ne tenê ji bo gelê Kurd û gişt netewên din ên Îranê, belkî heta tu mafekê ji bo nêzîktirîn dost û alîgirên Xumeyniyê rêber û damezirênerê vê rejîmê jî liberçav nagirin.

Kurdistana Îraqê bi xweşî ve cuda ye tevî beşên din ên Kurdistanê û serbarê aloziyên zêde ên navxweyî yên Îraq û herêmê, dîsan karên xwe ber bi pêş dibin û eva jî cihê hêviyê ye. Ger em bixwazin bas ji şêwazên çareseriya doza Kurd bikin, divêt bibêjin ku her beşek ji Kurdistanê pêka zirûfa xwe a taybetî, pêwîstî bi rêçareyek taybetî heye ku kurdên wan beşan di vê pêwendiyê de bi xwe divêt biryarê bidin, lê em weke Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, rêçareya fedralîzmê bi baş dizanîn, fedralîzmek ku li ser bingeha coxrafî û netewî be daku Kurdên ku di çarçoveya welatên ku têde dijîn, desthilta birêvebirina xwe hebin û di birêvebirina giştî a welat de jî pêka yasayê beşdar bin.

**Livîn: Nêrîna we bo opozîsyona Kurd di vê qonaxê de li hember rejîma Îranê de çiye?**

**Mistefa Hicrî:** Opozîsyona Îranî ku mezintirîn pirsên wan, akincîbûna rêberiya wan li derveyî Kurdistana Îranê ye, bihêztirîn û jihevnêzîktirîn opozisiyon e ku her yek ji wan pêka giranî û derbazbûya xwe di nava xelkê Kurd de alîgir hene. Ev pênaseya kurt derheq hêzên kurdî, bi vê wateyê nîne ku em ji rewşa wan hêzane û heta PDKÎ razî ne, belkî armanc berhevdanek e li hember hêzên jihevdu belavbûyî ên opozîsyona seranserî a Îranê. Di rastî de pirr kêm in ew hêzên siyasî ên ku bikarin di navxweyî welatê Îranê de li ser guhertinan xwedî bandor bin û ji aliyê xelkê ve bihên piştevanîkirin. Niha piştî encamdana binav hilbijartina gera 10 mîn a Serok Komariyê ku di 12ê' Cozerdana sala borî de birêve çû, dengdana xelkên nerazî ji ragihandina encama wê hilbijartinê, bû sebeb ku hêdî hêdî Îraniyên derveyî welat bi xwe ve bên û niha kombûnan pêk tînin û bas ji rewşa niha û pêşeroja Îranê dikin. Di 2-3 mehên borî de çendîn civînên girîng ên han li Amerîka, Feranse û Îtaliya de hatine lidarxistin ku li cihê xwe de hewceyê baldanê ne. Şanda nûneratiya Partiya Demokrat di wan hemû civînan de beşdar bûye û bona nêzîkkirina nêrîn û boçûnên cuda derheq rewşa niha û pêşeroja Îranê pirr hewil daye.

Bi vî awayî digîjin vê encamê ku hêzên opozîsyona Kurdî jî di qonaxa niha de ne cihê rezamendiyê ne, serbarê hemû ew pirs û astengên berbirûyê wan, divêt ew jî zêdetir hewlê bidin daku astengên ser rêya jihevdu nêzîkbûn û bîrkirinê di pilatformeke hevbeş de bona çavaniya xebat li dijî rejîmê û wê rejîmê vêde bibin. Çimku rejîma Komara Îslamî di vê qonaxê de zêdetir ji her demekê tevî kirîzên navxweyî û derveyî berbirû bûye û tu derfet û eqlaniyeteke îroyîn jî nine ku bikaribe bi ser wan kirîzan de zal be, belkî gişt diyarde bas ji zêdebûna kirîzan dikin.

**Livîn: Hûn di astê erk û berpirsayetiyên xwe ên dîrokî de zirûfa niha a opozîsyona Îranê, nemaze Kurd li hember guhertin û pêşhatan de çawa dibînin?**

**Misteha Hicrî:** Guhertinên herêmî, zêdetir ji warê nerênî ve bandor xistiye ser bizava rizgarîxwazane a gelê Kurd. Lê beşeke sereke a sedeman vedigere bo bîrkirinên nedemokratîk û paremayî ên hikûmetên welatên herêmê ku tu baweriyek bi mafê netewî ninin û mafxwaziya Kurd û gişt netewên din ên bê dewlet û mafbinpêkirî di arasteya lawazkirina desthilata navendî de dibînin.

Lewma ne tenê hevkar û yarmetîder ninin ji bo berbipêş xistina mafên siyasî ên netewa Kurd, belkî gellek caran di tepeserkirin û kuştina Kurdan tevî her yek ji dewletên hakim bi ser Kurdistanê de dibin hevpeyman. Li warê navnetewî de jî, ger em bi hûrî mêze bikin, rastiya wê eva ye ku -xincî Kurdistana Îraqê, ku li derveyî vîn û heza hikûmeta navendî, zêdetir seba hevkariya navnetewî, bi xweşî ve bûye xwediyê hikûmetek utonom û nîve utonom-tenê li warên mafê mirovî de mêzeyî pirsa Kurd dikin û gellek caran ku berjewendiya wan dixwaze ji wî kuncî ve bas ji pirsa Kurd dikin û nîgeraniya xwe derheq binpêkirina mafên wan diyar dikin. Siyaseta han jî heya niha kêmtirîn bandor hebûye heta li ser parastina mafê mirovan. Dewletên cîhanê, hem Rojava û hem Rojhelat, siyasetên wan li ser bingeha parastin û berfirehkirina berjeweniyên wan hatiye darêtin û di zirofa niha de, ev berjewendiyane bal Kurdan nahên dîtin. Bi vî awayî em dibînin ku heya

www.arsivakurd.org

niha jî boçûnên dewletan, nekarîne bandorek erênî a berbiçav li ser doza Kurd hebin. Lewma Kurd serbarê wê ku hewce ye hewil bide pêwendiyên xwe tevî dewlet û partiyên pêşkevtî ên herêm û cîhanê baştir bike û bi vê rêkê ve bala hêza cîhanî bo aliyê doza Kurd ve rabikişîne, lê divêt zêdetir li ser hêza xwe û siyaseta dirust û îroyîn a xwe hesêbê bike bona pêkanîna her terze guhertinek li ser çarenivîsa xwe.

**Livîn: Gelo hûn bi hewce nizanin ku di zirûfa han a hesas û girîng de navendekê kar û biryardanê bona berbirûbûn û karkirina heveş a partiyên parçe parçebûyî pêk bînin û pirsên çarenivîssaz weke armanca sereke û bingehîn bihesibînin?**

**Mistefa Hicrî:** Me weke partiyeke Kurdistanî û bibandor pêka hêz û şiyana xwe tevî nûnerên 16 saziyên siyasî û çandî ên netewên din ên Îranî – xincî farsan-nûnerên gişt netewên weke netewa Kurd, Belûç, Turk, Turkman û Ereb hevpeymanî pêk aniye û me li ser bingeha fedralîzma netewî- coxrafiyayî gişt hêz rêkxistin e bona karê hevbeş bi armanca pêkanîna hikûmetek demokrat û federal piştî hilweşandina rejîma Komara Îslamî a Îranê. Xincî wana em digel komek ji partî, sazî û kesayetiyên Îranî, çi çepgir û çi demokrat, li halê diyalogê de ne bi armanca jihev nêzîkbûnê û ger em bikarin emê hinek hevalbendiyan pêk bînin ku encama wê di xizmeta gişt gelên Îranê û azadî û yeksaniyê de be. Tevî vane hemûyan, em di navxweyî welat de mijûlê rêkxistina berdewam a xelkê Kurdistanê ne û kar dikin bo vê hindê ku di dema hewce de belavbûn û ji hevdu dûrketin bigîjin kêmtirîn astê xwe. Li warê karê ragihandinî de jî serbarê hebûna gellek kêmasiyan û nebûna îmkanatan, me hewil daye rastiyên siyaset û bernamên Partiyê bo xelkê ron bikin û nûnerê pêwendiyên me li Amerîka û Ewrûpa û herwiha li Kurdistanê di pêwendî û kombûnên berdewam de ne.

**Livîn: Gelo tu bernameyek ya hewla jihev nêzîkbûn yan yekxistnewa her du beşên niha ên Partiya Demokrat, li holê de ye li halekê de ku hûn bi xwe bandorên nigetîv ên vê cudabûnê bi başî hest pê dikin?**

**Mistefa Hicrî:** Derheq parçe parçebûna partiyên Rojhilatî û karkirina hevbeş bihev re, piropagendeya her yek ji wan partiyan, (nemaze yên ku cuda bûne) li pêwendî tevî yekgirtinê û eva ku her yek ji wan xwe bi alahilgirê bihevrebûn û yekbûnê dizane, hinek di çarçoveya dirûşm û fêlkariyan de ye, lewma heya niha serbarê wan hemû dirûşman, heta yekbûnek lawaz jî di nava wan hêzan de pêk nehatiye. Derheq wan kesên ku nêzîkê çar salan beriya niha ji Partiya Demokrat cuda bûne, ger wan bawerî bi yekgirtin û bihevrekarkirinê heba, qet cuda nedibûn û aliyê kêm ger cuda jî dibûn, navê Partiya Demokrat bi neheq ji xwe re hilnedigirtin û bi vî awayî asteng li hember bihevrekarkirinê de pêk nedianîn. Em şahid in ku di hemû beşan de aliyê kêm di 10 salên borî de, aliyên ku ji partiyekê veqetiyane, zêdetir bi qebûlkirina navek nû tekoşîna xwe bi terzekê ku bi qazanc zanîne, domandine û rê ji bo hevkarîkirinê tevî ew partiya ku jê veqetiyane, xweş kirine.

Em jî di Partiya Demokrat de herdem amade bûne û amade ne ku tevî wan hevalên xwe ên berê li ser karkirina xwe li ser gellek waran de bikevin diyalogê. Bo vê yekê jî tenê daxwaza me eva ye ku navê Partiya me li ser xwe rakin û navek din ji xwe re hilbijêrin daku em bikaribin rê ji bo vê pêşveçûnê xweş bikin.


**Livîn: Rewşa mafê mirov û azadiyên medenî di Îranê de ketiye jêr pirsiyarê û çendîn tv û saziyên civaka sivîl di cîhanê de ev karê rejîma Îranê xistine berbas û lêkolîn û rexneyên zaf derheq girtin û bidarvekirina xelkê azadîxwaz ji aliyê rejîma Îranê ve hebûne Gelo rola opozîsyona Îranî di vê pêwendiyê de çi bûye?**

**Mistefa Hicrî:** Komara Îslamî a Îranê seba vê çendê ku di nava xelkê de xwediyê tu pêgehekê nîne û bi tewahî ji xelkê dûr ketiye, bûye hêzekî dijî xelkî, yan em dikarin bibêjin ku xelk û rejîm du aliyên bi tewahî ji hev cuda û dijî hev in. Xelik hemû xebatê dike ji bo bidesxistina azadî, kar, nan û hemû ew hewcehiyên madî û menewî ên ku rejîmê ji wan standiye û dagîr kiriye. Ji aliyek din ve armanca rejîmê

## Komara Îslamî a Îranê seba wê yekê ku reh û rîşal di nav xelkê xwe de nine û ji xelkê veqetiyaye, bûye hêzek li dijî xelkê

jî tenê parastina desthilata xwe bi her nirxekê ye. Daxwazên xelkê nemaze daxwazkirina azadiyan bi tewahî tevî armancên rejîmê dijî hev in û rejîm baş dizane ku azadiya xelkê dibe sebebê nemana rejîmê. Rikeberî û bihevre berbirûbûna xelkê û rejîmê di vê pêxemê de her ji roja bidestve girtina desthilatê ji aliyê rejîmê ve destpê kiribû û di wan salên derbazbûyî de berfirhetir bû, bi terzekê ku ger di destpêka bidestvegirtina desthilatê ji aliyê rejîmê ve tenê hejmarek kêm ji sazî û kesayetiyên siyasî dijî rejîmê bûn, dijberiya han niha gelek ji kesayetiyên olî jî bi xwe ve girtiye ku ji piştevan û heta hinek ji wan damezirinerên rejîma komara Îslamî bûn. Rejîm li hember daxwaz û nerazîbûnên xelkê take rêyek ku girtiye pêşiya xwe, tepeserkirina xelkê azadîxwaz û xebatkar e. Di vê pêwendiyê de binpêkirina mafê mirovan, tengkirina azadiyan, bêkarî û bêdahatiya xelkê û zorbûna hejmara bengdaran bi madeyên sirker di Îranê de dengvedanek berfireh di cîhana pêşkevtî û kom û civatên cîhanî ên mafê mirovan de hebûye. Di sala derbazbûyî de Îran li warê daliqandinê, piştî welatê Çînê di cîhanê de pileya yekem hebû. Herwiha Îran bi zindanîkirina rojnamevanên serbixwe nav derkiriye. Kiryarên han ên rejmê jî bûye sebeb ku rejîma Îslamî a Îranê heya niha bi dehan car ji aliyê Civata Ewlehî a Netewên Yekbûyî û saziyên parêzerê mafê mirovan were mehkûmkirin. Hewce ye ku em li vir îşare bi vê yekê jî bikin ku asta tundûtûjî û binpêkirina mafê mirovan di nava netewên Îranê de nemaze di nava netewa Kurd de gellek zêdetir û berfirehtir bûye. Rola opozîsyona Kurdî û heta opozîsyona seranserî xincî xebatkirin dijî rejîmê û eşkerekirina wan kiryarên dijî mirovane tu tiştek din nîne. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di vê pêxemê de gellek çalakane kar kiriye û herwiha karên xwe didomîne.

# Pasdarek Rejîmê: Bi Sê Hereketan Emê Amerîkayê Biçûkde Bînin



Serokê Îdareya Operasiyona Sitada Giştî a hêzên çekdar got: Me hêzên nîzamî bi fermandehiya Rêberê mezin amade kiriye û bi Amerîkayê radigehînîn ku ger qesta destdirêjiyê bo ser Îrana Îslamî hebe, em bi sê hereketan wê bi çukde bînin.

Serdar Şadimanî got: Di yekemîn kiryar de emê tengeya Hurmizê bi destve bigrin û înza tu hereketekê bi tu kesî nadin û di wî warî de me heya niha çendîn temrîn kirine û me şiyanên xwe nîşanî Amerîkayê dane.

Di hereketa dûyem de, terha me eva ye ku em hêzên Amerîkayê ên cihgîrkirî li Efxanistanê û Îraqê bi barimte bigrin û înza tu hereketekî nedin wan.

Herweha wî got: sêyemîn karê me evey, çunku em dizanin ku Îsraîl hewşa veşartî a Amerîkayê ye, ger biçûktirîn tecawiz bi Îranê bihê kirin emê aramiya wê hewşê têk bidin û me ew yeka bo Amerîkayê eşkere kiriye.

www.arsivakurd.org

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên ”Agirî” re



**Ebdulla Hicab**

# Li wir maf e li vir sûç, temaşe wî aqlê pûç!

Azadiya olî ji bo bisilmanan li welatekê ku xwe bi parêzerê pîvan û nirxên dînê Îslamê dizane, dibûya cihê nîqaşê nebe. Lê nayê înkar kirin welatên ku herî zêde mafê oliye bisilmanan binpê dikin, hema welatên bisilman bi xwe ne. Li welatên ku piraniya xelkê wan alîgirê meshebê Sunnî in, mafê Şîeyan tê binpêkirin, li welatê ku Şîe tê de serdest in, alîgirên meshebê Sunnî ji ber bêmafiyê hawar dikin. Li çarçoveya sîstemên siyasî bi der, nakokiyên nava civakê bi xwe jî weke asteng li ser riya bihevre jiyana alîgirên dîtinên cudaye olî di çarçoveya welatên bisilman de xwe nîşan didin.

Serkêş û pêşengê bêedaletî û binpê kirina mafên olî di cîhana Îslamê de, îrorojê rêjîma Komara Îslamî ya Îranê ye. Di heman demê de, gava mijara bikar anîna dîn weke emrazê siyasetê jî tê rojevê, dîsan her Îrana Îslamî di rêza herî pêşîn de ye. Ji dirûşm û siyaseta rojane ya Îranê di hundirî welat de bigre heya bernameyên rêjîmê di asta cîhanî de, her pêgavên ku rêjîm bi navê siyasetê an bi nave diyanetê radike, nîşan dide ku Îran bi çi awayî dîn weke emrazê pêşvebirina siyaseta xwe bikar tîne. Ew yek jî bi dîtina îdeologên Komara Îslamî re bi tewayî hev digre ku hertim dibêjin “diyaneta wan eynî siyaseta wan e û siyaseta wan jî her eynî diyaneta wan”.

Ev nêzîkbûna dîn û siyasetê li Îranê tê wê manayê ku her çawan di siyasetê de îmkana danustan, netifaqî, lihev kirin, serketin û binketinê heye, bi wî awayî dîn jî dikare bikeve nava bazarê. Lê weke çawan îro bazara siyaseta Îranê kesad e û ne di navxweyî welat bi xwe de û ne jî di asta cîhanî de tu bawerî jêre nemaye, her wisan jî bazara dînê dewletî li Îranê êdî ciyê baweriyê nîne.

Rêberên Komara Îslamî di heman demê de ku basî biratiya navbera bisilmanan dikin, ya destê wan tê dikin heya birayên xwe yên bisilman ku têgehîştinek cuda ji ya wan li dînê Îslamê hene bêhêz bikin û ji meydanê derxin. Li navxweyî Îranê zirbirayên xwe yên bisilmanê sune ji hemû deselat û derfetên siyasî, abûrî û birêveberiyê bêpar dikin. Li Efxanistan, Îraq, Lubnan û li Pakistanê jî çek û teqemeniyê didin komên belengaze şîe heya li dijî birayên xwe yên sunne bikar bînin.

Di asta îdeolojîk de jî ayetullahên ku îro bi dîn û dîndariyê dilîzin, ferman û fetwayên dînî li dijî “birayên” bisilman yên sunne derdixin. Bi riya tundajoyên weke Mehdî Danişmend re ku bi xwe bûne koka netifaqî û ajaweyê, bêrêzî û bêhurmetiyên herî mezin bi bisilmanên sunne dikin, lê di heman demê de jî basî biratiya bisilmanan dikin. Ji wê hê bêşermtir, rêberên Komara Îslamî her tim dersa bihev re jiyan, parastina mafên olî û xwedî derketin ji mafên bisilmanan didin rêberên cîhanê.

Ev çend roj in ku mijara avakirina mizgevtek mezin li “Manhattan a New York” ê, nêzîk ciyê ku 9 sal beriya niha Navenda Bazirganiya Cîhanî (World Trade Center) lê bû û bi destê endamên El-Qaide hate teqandin, ketiye rojevê. Di wê navberê de Komara Îslamî bi hêceta parastina mafên bisilmanan ketiye nava tevgerek xurt û li dijî kes û aliyên ku naxwazin navendek wisa bê ava kirin propagendê dike. Ji propagendê hê zêdetir, Komara Îslamî hemû hewlên xwe yên dîplomatîk û siyasî bikar tîne heya bide selimandin ku Amerîka çiqas dijminatiya bisilmanan dike û rê nade ku mizgevtek bisilmanan li “New York” were ava kirin. Weke qaşo bi xwe hemû mafê bisilmanan parastibin, dest avêtiye şîret û nesîhet kirina rêberên DYA ê.

Lê beriya ku Komara Îslamî bikaribe banga xwe ya xapînok bigehîne ciyekê, karbidestên Amerîka bi xwe rêbaza siyaseta Amerîka di wê derheqê de diyar kirin. Li gor pilana ku ji aliyê karbidestên bajarê “New York” ê ve hatiye pejirandin û birêveberiya Obama jî ew pilan erê kiriye, biryar ewe ku li nêzîk Manhattan bînayek (awahiyek) ku ji 15 qatan pêk tê ji bo mizgevt û navendek Îslamî bê ava kirin. Manhattan ji bo xelkê Amerîka sembola êrişa terorîstî a 11’ ê îlona 2001’an e. Lewma hin kesayetî, sazî û dezgehên siyasî, kultûrî û civakî li Amerîka li hember ava kirina navendek Îslamî, ew jî li ciyê ku li wir dîn weke emrazê siyasetê ji bo kuştina kesên bê guneh hate bikar anîn, rawestiyan.

Li hember wê dîtinê Serokkomarê Amerîka, bi fermî ragehand ku azadiya olî li welatê wan ji bo her dîn û meshebekê weke hev heye û kes nikare pêşiya ava kirina navendek Îslamî ji bo bisilmanên “New York”ê bigre.

Bi wê niqaşê re, bi cî ye ku ji karbidestên Komara Îslamî bê pirs kirin ka gelo heya ku ewan bi xwe rê dane ku li bajarên mezin ên Îranê, ku li her yek ji wan bi dehan hezar bisilmanên sune dijîn, mizgevtek suniyan bê ava kirin! Di gel ku li bajarê Tehranê pitir ji yek milyon bisilmanên sune dijîn, lê hê rê nehatiye dan ku bi tenê yek mizgevta suniyan jî li wir were ava kirin. Li bajarê Meşhedê heya sala 1993 tenê avahiyek piçûk weke mizgevta suniyan dihate bi karanîn. Lê di wê salê de ew avahî jî hate wêran kirin û ji wê demê ve suniyên Meşhedê bê mizgevt in. Îro herî kêm li 16 parêzgehên Îranê bisilmanên sunî dijîn, lê rêjîma Komara Îslamî li derveyî gund û bajarên Kurdistan, Belûçistan û Turkmen Sehra, mafê ava kirina tenê yek navenda olî jî ji bo ibadet û Xwedaperistiya bisilmanên sunne yên Îranê bi rewa nabîne.

Azadiya olî û azadiyên din heya ku li DYA, welatên rojava û di sîstemên demokratîk de tên parastin ne mijara wê kurte basê ye. Gotin ewe ka gelo bazerganên ol û diyanetê bi çi awayî dîn weke emrazê siyasetê bikar tînin û heya ku li ser azadiya dîn û bihevre jiyana mirovan disekinin!

Di çarçoveya Komara Îslamî de hemû ew maf û azadiyên ku mirov weke tak, ji ber însaniyeta xwe pêwîstî pê heye bi suç tên dîtin. Hemû pîvanên mafê mirovan, azadiya ramanê, azadiya olî û heta azadiya kinc li xwe kirinê li Komara Îslamî ya Îranê qedexe ne. Lê dema mijara bazirganiya bi dîn û siyasetê re tê rojevê, Komara Îslamî li derveyî sinûrên xwe û ji bo xelkê din îdiaya parastina wan mafan dike. Di heman demê de rêjîm wisan nîşan dide ku di asta navneteweyî de tenê ewe ku piştgir û parêzvanê mafê bisilmanan e.

Rêjîma ku di nava sinûrên xwe de mirovan tenê ji ber ku daxwaza mafên bingehîn ên xwe dikin, ji ber ku dixwazin bi zimanê xwe bixwînin, bi zimanê xwe ibadetê bikin, ciyekê ji bo taet û nivêjên xwe ava bikin, digre, dikuje û kesayetiya tak dişkêne, di heman demê de îdiaya xwedî derketin ji mafên bisilmanan li ciyek din tîne rojevê. Lê ji wê yekê nafikire ku bazerganiya bi dîn re êdî di civakê de kiryar nînin. Mafê ku li welatekê ji bo komek mirovan rewa ye, li welatek din û ji bo komek ji mirovên din yên xwediyê baweriyek cuda jî her rewa ye. Ger kes, alî an deselatdarek hebe ku bawerî bi wê pîvanê nebe, dibe bêjin “mejî betal e û aqil pûç”.

www.arsivakurd.org

# Fitwayek ku her goriyan distîne



**Selah Muradî**

31 salan berî niha di roja 28' ê Gelawêja sala 1358" a Rojî (hemberî 19ê Tebaxa 1979'an) de, Xumênî, damezirîner û rêberê rejîma teze bi desthilatgihîştî a Komara Îslamî a Îranê, fitwaya "cîhad" ê bi dijî netewa Kurd li Kurdistana Îranê de derkir.

Di ola Îslamê de "cîhad" dijî dijberên vê olê û ew mirovên ku bi dîtin û nêrîna vê olê ve bi kafir tên naskirin, ragihandin.
Xumênî cîhada li dijî neteweyek bisilman ragihand ku take tawana wê, daxwazkirina mafên netewî ên xwe di çarçoveya Îranê de bû.

Li gor dîtina Xumênî, madem ku Kurd li ser daxwazên xwe ên netewî pêdagir in û amade ninin ku stûxwar û guhgirtiyên rejîma wî bin, kafir in û qirrkirina wan rê pê hatiye dan. Xumênî rejîma xwe bi Îslamî û xwe bi Welî Feqîh û cihgirê Îmamê Zeman dizanî û di bingehên fikrî ên Xumênî û di yasayên sîstema Wîlayeta Feqîh de tu mafek bo netewan û rêçareya aştîxwazane bo pirsa pirrnetewî a Îranê liber çav nehatiye girtin.

Xumênî bi derkirina fitwaya cîhadê, rêçareya şikestxwarî a tundûtûjiyê hilbijart û bi wî awayî şerekî seranserî bi ser netewa Kurd de sepand û hest û soza olî a xelkê Îranê bo qirkirina azadîxwaz û xebatkarên netewa Kurd biziwand.

Di encama wê fitwayê de bi dehan hezar kes ji xelkê Kurdistanê ji aliyê cehad pewerên Xumênî ve hatin kuştin. Kuştina xelkê Kurdistanê û tepeserkirina wan bi tawana mafxwaziyê, niha jî 31 sal piştî wê fitwayê didome û fitwaya cehadê rojane li Kurdistanê goriyan distîne. Zêdebarê wan hemû gorî û kuştinan jî, netewa Kurd her wa li ser daxwazên xwe ên netewî pêdagir e û rêçareya cehadê jî nekarî pirsa Kurd di Îranê de çareser bike.

Rojev

# Dema biryardanê

**A: Arîn**

**rondik24@yahoo.com**

Liv û bizavên Amerîka li deverê û anîna hêz û alavên leşkirî û gefên berdewam yên Îran, Îsraîl û Amerîkayê bo ser hev, eger û nîşaneyên şer û aloziyek din li deverê de digehînin. Herweha bihêzkirin û jordebirina şiyan û karînên leşkirî yên welatên erebî li devera "Xelîc Fars"ê de, yekî din ji nîşaneyan e ku amerîka dixwaze hevsengiya hêzê him bo êrîşa ser Îranê û him jî li egerek din de bo berbirû bûna tevî Îranek etomî de biparêze. Li pêxem vê stratejiyê de jî Amerîka dixwaze yekem car Erebistana Seûdî û Kuwêtê pirçek bike û 84 balafirên şer yên F15 bifroşe Erebistanê û 209 mûşekên Patiryot jî bifroşe Kuwêtê. Ew danûstandinên çek û teqemeniyan li navbera Amerîka û hevalbendên xwe de dide xuyandin ku civaka cîhanî li ser pirsa navikî a rejîmê gihîştiye qonaxa dawîn û binbestê û xwe ji bo qonaxek dijwar berhev dikin.

Ew gef û gurr, manovrên leşkirî, ceribînên mûşekî ên nû û liv û tevgerên deverî û yargîriya wan li vê dawiyê de, beşek in ji piroseya şerê rewanî û ragihandinî, herweha destpêka qonaxa nîşandana çeng û didanan ji hev.

Eva jî li encama berdewamiya Komara Îslamî di piroseya meyandina Uraniyomê, serhişkiyên wan û guhnedan bi biryarname û yasayên navnetewî de ye ku nigeraniyên navnetewî li dor vê pêvajoyê de zêdetir kirine. Bi taybet ragihandina bikarxistina nawenda etomî ya Bûşehrê bûye sedem ku carek din cîhan vecinîqe û metirsiya naveroka vê rejîma dijî mirovahî û hov ku li rastaya bidestxistina çeka navikî de gavan hildigre, hest pê bikin.

Lewma em dibînin ku dîsan qala êrîşa leşkirî ketiye rojevê. Li vê derheqê de jî me dît ku Can Bulton, nûnerê berê yê Amerîkayê li NY' de hişyarî da Îsraîlê ku tenê 8 rojên



din dem heye ku êrîşê bike ser vê nawenda etomî, nexa piştî wê dê gelek direng be, çunku wê demê her terze êrîşek dê bibe sedema belavbûna tîrojkên etomî û dê zirarê bigehîne şaromendên sivîl. Eve jî di halekê de ye ku pir caran Amerîkayê ragihandiye ku hemû rêçare ji bo pêşîgirtina Îranê di warê navikî de amade ne.

Li hember de jî Xamneyî, rêberê Komara Îslamî çend rojan berî niha di axaftinekê de him qada şerê bi Amerîkayê li egera êrîşa leşkirî bi vî welatî re eşkere kir û him jî amadegiya bimerc a xwe ji bo gut û bêjên bi Amerîkayê re nîşan da. Li gor Xamineyî, li egera êrîşê de qada şer dê berfirehtir ji deverê be. Herweha dawîanîn bi eva ku wî bi " gef, tehrîm û zorî" da zanîn, ji mercên sereke yên Komara Îslamî ne bo gut û bêjan bi Amerîkayê re.

Bi giştî biryara dawîn, çi şer û çi jî çavnihêrî, biryarek nine ku mirov gelek pê xweşbîn û bibawer be. Çunku êrîşa leşkirî jî bi qasê hikûmeta îlahî a xwedî çeka etomî metirsîdar û pirzirar e. Ji hêla din ve jî welatên erebîyên derdora Xelîc Farsê jî bi qasê Îsraîlê ji Îrana etomî tirs û xof hene, nemaze ger bi eşkereyî jî ranegehînin. Her wekî wê ku Yûsif Etiye, balyozê Îmaratê li NY de ragihand ku em nikarin bi Îranek navikî re bijîn û diyar kir ger ku Amerîka pêşiya etomîbûna Îranê negre, gelek ji welatên derdora Xelîc Fars"ê dê ji hevalbendiya bi Amerîkayê re poşman bibin û dê tevlî hevalbendiya Îranê bibin.Lewma niha Amerîka û Îsraîl li hember dem û qonaxek çarenivîssaz û li durêyekê de cî girtine, êrîşa ser Îranê yan qebûlkirina Îrana etomî. Lê hinde nakişîne ku her yek ji wan neçar bin biryara xwe ya dawîn û bersiva vê pirsiyarê bidin. Helbet eve di halekê de ye ku melayên kewneparêz berî wan duyan negihîjin tu encamekê, çunku xeter li ser serê wan e.

www.arsivakurd.org

# Kurd û referandoma Tirkiyê



**Şakir Molayî**

Destûra niha ya Tirkiyeyê piştî kûdetaya sala 1980'an ji hêla kûdetaçiyan û di berjewendiya hêzên leşkerî de hatiye nivîsandin ku nedemokratîk û kêmasiyên zaf têde hene û divê bê guhertin. Bi salan e ku Hikûmetên li dû hev yên Tirkiyê li gorî vê destûrê birêveberiya welat dikin û li gorî heman destûrê neheqiyek zaf derheq gelên neturk û yek ji wan jî kurd kirine û heya niha bi hezaran siyasetvan, rewşenbîr, ciwan û kalên kurd di girtîgehên Tirkiyê de hatine îşkencdan û rizandin, bi hezaran hatine kuştin û bêser kirin, gundên kurdan hatine kavilkirin, zimanê kurdî hatiye qedexekirin û siyaset, axaftin, xwandin, nivîsîn û jiyana azad li kurdan hatiye heramkirin, bi giştî ketine ber pêl û tîrojkên asmîlasiyonek dijwar. Destûrek ku niha desthilatdarên Tirkiyeyê bi awayekê îtiraf bi kêmasiyên wê dikin ku bi salan azadiya welatiyan binpê kir û di vê navberê de zirarmendê sereke kurd bûne.

Piştî hatine ser kar a AKP'ê ku siyaseta wê li dijî berjewendiya general û kemalîstan e, dest bi lêdan û herifandina bingehên kemalîzim û erteşê hatiye kirin û em dibînin ku hikûmeta vî welatî di hewla guhertina hin xalên wê destûra nedemokratîk de ye û bo vê meremê jî paketek amade kiriye ku piştî pesendkirinê li parlementoya wî welatî de dixweze danê ku qirar e li12ê Îlona 2010'an de li seranserî Tirkiyeyê de bikeve ber refrandom û xelkê wî welatî çarenivîsa wê diyarî bikin. Her çiqas ku ew xalên ku dibine sedema înkar, zulm û zorî, bêedaletî û daxistina partiyên siyasî ku kurd goriyê sereke yên wan in, her li cihê xwe de dimînin, lê gelek xalên din jî hatine guhertin ku rê li perwerda kurdî digirtin û rê dide generalan her dema ku bixwazin bi rêya kûdetayan ve welat bixine bin postalên xwe yên bixwîn. Lê ev reformên biçûk li destûrê de rê bo maf û azadiyên berfirehtir xweş dikin û hêviya bi azadî û guherînên din jî zêdetir dikin.

Li hember vê pêvajoyê de jî partiyên opozîsyonê yên nejadperest û statûkparêz weke MHP û CHP, bi tewahî ketine çepera dijî wan hûrde reforman û ew yek bi parçekirina welat didin zanîn, û daxwaz ji alîgirên xwe kirine ku wê refrandomê baykot bikin. Ji hêla din ve jî Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) jî ku mezintirîn partiya kurdan û xwedî gurûp e li Parlementoya Tirkiyê de, beşdarîkirin di vê refrandomê de ret kiriye û daxwaz ji kurdên Bakur kiriye ku beşdarî refrandomê nebin.

AK Partiyê di paketa ku bo refrandomê amade kiriye çend xal danîne ji wan:

1. Her aliyek ku hewla kûdetayê di welat de bide, divê bê dadgehî û ceza kirin.
2. Parastina mafê take kesî.
3- Nasandina mafê karmendên sendîkayî weke mafê karmendên hikûmetê.
4- Kesên serbazî yan arteî jî divê di dadgehên sivîl de bên mehkeme kirin.

Ya ku li paketê de pêwendî bi mafê kurdan heye û dewlet jî bi awayekê dixwaze wê bike faktera piropagandaya xwe, ew e ku mafê kurdan di xala parastina mafên take kesî de dibîne. Raste ku li gor vê xalê hin maf misoger dibin û kurd jî wek her şaromend û takekesek Turkiyê dikare ji wê xalê bi mifah be, lê girîngtir ji wê eve ku kurd neteweyek e û divêt ji mafên xwe yên netewî û siyasî behremend be û ew neheqiyên ku bi dehan sal e jê tê kirin bihê serrast kirin. Lê gelo di paketa refrandmê de îşare pê hatiye kirin yan kurd wekî aliyekê hatiye naskirin? NA. Eve jî serbarê wê ye ku AKP demek dirêj e projeyek bo çareserkirina pirsgirêka kurd amade kiriye û propagandayan bo dike. Virde dîsan nezalalî û dufaqiyek di kar û bernamyên hikûmetê de heye û nekariye dilê kurdan bidest bixe û niyeta pak a xwe nîşan bide û nigeraniyên kurdan jî verevîne. Her eva jî bûye sedem ku niha raya giştî a kurd li bakûr de dudil û nîgeran bin û bi vê sedemê jî niha beşek berbiçav ji kurdên bakûr heya niha bi eşkereyî referandom baykot kirine û bi nîsbet kiryar û gavên AK partiyê bi guman in û dibêjin ku ew dixwaze bi hin mafên biçûk, mafên sereke û bingehîn yên kurdan wunda bike û desthilata xwe bi ser kurdistanê de berfirehtir bike.




Lê ji hêla din ve jî eva nabe sedem ku ger piraniya mafên kurdan di piroje yan paketekê de nehên cihdan, ew jî red bikin û bêjin yan gişt maf yan hîç, yan reş yan sipî, yan Sifir yan Hezar! Gerek em bizanibin desthilatek ku heyanî îro înkar û îmhaya gelê kurd kiriye û bi hemû awayekê hewla jînosayd û asmîlekirina gelê kurd daye, lê niha îtiraf bi hebûna kurd û mafê kurd dike, li cihê xwe de guhertin û pêşdeçûnek mezin e. Lewma raya giştî û partiyên siyasî yên kurd niha li hember bijardeyek gelek hesas û dijwar de cî girtine û divêt bi zanebûn û bi nirxandin û xwendinek rast, dûrbînane û realîte ji bûyer û rewşa siyasî ya Turkiyê, helwestek hêja bigrin û kerek nekin ku li pêşerojê de bikewin ber lome û gazindeyan û ji kiryara xwe poşman bibin û zirarê bigehînin pêvajoya çareseriyê,

çunku Tirkiyeyê li ber guherînên gelek mezine de ye û kurd jî divêt bizanin ku çawa rola xwe li nav hevkêşeyên siyasî de bilîzin û berevaniyê ji mafên xwe bikin.

Xalek din ya girîng jî yekîtî û yekrêziya nav texên gel de ye, nabe bi tu awayekê gelê me yekîtiya xwe bikin goriyê berjewendiyên demkî û serbarê parastina yekîtiya xwe, divêt berjewendiyên giştî û netewî serdest û serweyî her tiştî bizanibin, çunku yekîtî hertim garantiya parastina deskevt û bi destxistina mafan e.

## Tunebûna xwarina şîvê, jiyanek stand



Rojane di jiyana Însanan de bûyerên gelek nexeweş û tehl çêdibin. Yek ji wan bûyeran, li Farqînê çêbû. Babekî, berpirsê malbata xwe bi destê xwe dawî li jiyana xwe anî. Hacî Oruc kesek zewicî û babê 4 zarokan bû. Tu karê wî tunebû. Wî piraniya caran hinek parêz yan jî fêkî datiniyan ser arebana xwe ya dest û li kolanan diforot. Eger carê destê wî bihata, karên din jî dikir. Rojane îdara mala xwe dikir. Lê rojek ji roja meha Remezanê derket û tu karek nekir, êvarî destvale vegeriya mala xwe, lê ji nebûniyê de jina wî tu xwarin ji bo fitarê çênekirîbû. Ji jina xwe pirsî ewê bi çi bifitirin? Şîv çiye? Bersiva jina wî dayî, ew di cih de cemidand. Jinê gotê; şîv tuneye, tiştek tinebû ku ez şîvê çêbikim.

Hacî Oruc deng nekir, çû yek bi yek zarokên xwe maç kir û ew li ber singê xwe ve şidandin. Piştre derbasî aliyê din yê malê bû. Qederekî tu deng ji Hacî nehat. Dema jina wî lê geriya, dît ku Hacî benek avêtiye sitûyê xwe û xwe xeniqandiye.

Hacî babê 4 jarokan bû, zarokên wî; 11, 7, 5 û 1 salî ne.

www.arsivakurd.org

# Bila em ji kurdistanîbûna bajarên xwe xwedî derbikevin



**Mecîd Cinîkanlo**

Li madeya 62, 63 û 64'ê a peymana Sêvr de ku ji aliyê hêzên hevpeymanan ve hate girtin, bas ji avakirina dewleta Kurdî ya serbixwe li herêma Mûsilê hatiye kirin! Li gorî vê Peymanê Kurd piştî rapirsiyê dikarin dewleta xwe a serbixwe li Herêma Mûsilê ava bikin, lê mixabin dîsan wek hemû carên din Kurd dîsan bûne qurbaniyê sat û sewdayên hêzên biyanî û dîsan serxwebûn ji bo Kurdan kirin xewn û xeyal. Li gorî wan Madeyên ku li Peymana Sêvr de hatine nivîsandin, tevahiya herêma Mûsilê Kurdistan e, û xaka Kurdan e. Mixabin yek ji siyasetên herî qirêj yên desthilatdarên zal bi ser Kurdistanê de, bê nasnamekirina bajarên Kurd akincî û dana nasnameyekî xeyrî Kurdî bi wan bajaran e. Serdemekê eger Kurdan xwastiban navenda herî bihêz ya Kurdistanê nav bibin, bêşik û guman, navê Mûsilê dianîn ser ziman. Lê îro rojê Kurd xwe Mûsilê bi bajarekî Erebî didin nasandin.

Nebûna Siyasetekî baş û bi pilan û bername, hemû bûne sebeb ku Kurd parekî zaf ji Xaka Kurdistanê ji dest bidin. Ev axa ku bi salan bav û kalên me ji bo wê xwîna xwe dan û bi dehan hizar Kurd li ser parastina vê nasnameyê hatin Kuştin û hatin dûrxistin. Eva ku rast e û Kurd dibe dersê ji van karesatan werbigirin, ev e ku carekî din wan şaşiyên berê ducarî nekin, belkî hemû hêz û rêxistinê Kurdî li derveyî hemû siyaset û nakokiyên navxweyî divêt li ser parastina axa Kurdistanê hevhizr û hevxebat bin.

Kerkûk wek bajarekî Kurdîstanî ku bi salan Kurdan ji bo parastina nasnameya Kurdistanîbûna vî bajarî xwîn dan û berxwedanî kirin û bi hezaran ciwanên Kurd seba parêzgarî ji vê nasnameya Kurdî canê xwe gorî kirin, îro rojê bi awayekî zor sade û li ser esasê berjewendiyên take kesî û partiyên siyasî ketiye nav rewşekî herî aloz û Kurd renge bi zehmetekî zaf bikarin careke din ev bajarê ku bi xwîna Kurdan hatiye avdan, li destê şovînîstan rizgar bikin. Bajarek ku ji aliyê Mela Mistefayê Barzanî ve wek dilê Kurdistanê hatiye binav kirin.

Her wek me li hilbijartinên vê dawiyê yên herêma Kurdistan û Îraqê de dît, seba nakokiyên nav refên hêzên Kurdî li başûrê Kurdistanê, Kurdan bi rihetî parek mezin ji dengên xwe ku dikarin belgeyeke din ji bo nasnameya Kurdî ya vî bajarî ban, li dest dan û tu kes û partiyeke Kurdistanî başûrê Kurdistanê xwe li hemberî vê yekê sebebkar û berpirsyar nizane?!

Mistefa Kemal Ataturk dibêje: bila bi sedan ciwanên Turk bihên Kuştin, lê bihostek ji xaka me kêm nebe, çimku dayîkên Turk bi sedan ciwanên Turk ên din dê bînin dinê, lê hemû dayikên Turk nikarin yek buhost xakê ji bo me bînin.

Kurd ne wek Neteweyek dagîrker, û ne wek Kemal Ataturk, belkî Kurd xwediyê xaka xwe ne û naxwazin xaka tu kesekî jê bistînin. Kurdan bi salan ji bo vê xaka pîroz qurbanî dane û nasnameya Kurdistanîbûna wan bajaran bi xwîn û xebata xwe dane nasandin. Pêka hemû sened û belgeyên dîrokî ev bajar xaka Kurdistanê ne û Kurd bi hezaran salî ye ku li ser vê xakê dijîn.

Niha dewleta nejadperest a Turk û Komara Azerbaycana bakûr bi pîlan û bernameyan û bi piştevaniya madî ji hin girupên Turkên Îranê, li hewla kirîna xaka Kurdan li parêzgeha Azerbaycana Rojava de ne. Li gorî nûçeyan bername û pîlana kirîna xaka Kurdan li parêzgeha Azerbaycana Rojava û bi taybetî li 4 bajarên Urmiye, Selmas, Xoy û Makûyê, bi awayekî sîstimatîk didome û parek mezin ji xaka Kurdan ji aliyê Turkan ve hatiye kirîn!

Eger em mêzeyî demografiya bajarê Urmiyê bikin, bi rohnî ji bo me xuya dibe ku ew bajarek Kurdistanî ye. Nêzî 80% ji gund û herêmên ser bi bajarê Urmiyê, ên Kurdan in, û di nav bajar de renge Kurd û Turk beramber bin.

Di rastî de piroseya bênasnamekirina bajarên Kurdan piroseyek e ku bi salan ji aliyê rejîmên dagîrker ve tête meşandin. Rejîmên dagîrker bi mifahwergirtina ji amraz û dirav bi hemû awayekê dixwazin bajarên Kurdan ji wan bistînin. Di vê navberê de hêzên dagîrker û faşîst li hewla dagîrkirina bajarên Kurdan de ne. Siyaseta giştî ya desthilatdarên Turk li Komara Turkiyê peydakirina sînorekî hevpar li gel Turkên Îranê ye. Eger em mêzeyî xerîte û cuxrafiyaya Kurdistanê li çavkaniyên berê da bikin, sînorê Kurdistanê li Komara Azerbaycan û Ermenîstanê dest pê dike, û her wek em dizanin û li dîrokê de heye, Kurdan li sala 1927'an de Komareke serbixwe li Soviyeta berê hebûn ku li nava Kurdan de bi Kurdistana Sor hatiye nasîn. Lê sed heyf û mixabin ew Komar jî seba berjewendiyên derekî têk çû, û dîsan Kurd ketne ber êrîşa dagîrkeran. Îrorojê piştî salan jinavçûna Komara Kurdistana Sor sed heyf û mixabin Kurdan bi çi awayekê ji bo nasnameya Kurdistanî ya wan bajar û herêmên xwe ku parek ji axa bav û kalên me ye, xebat nekirine û bigre li nava kêm Ji xerîteyan de ev beş li xaka Kurdistanê dihê berçav girtin. Li rastî de siyaseta paşekişeya hertimî ya Kurdan û dest berdan ji xaka Kurdistanê bûye sebeb ku Kurd rojbirojê parek ji axa xwe ji dest bidin, axek ku Kurdan ji bo vê bi salan xebat kiriye. Li piraniya çavkaniyên Îranî û derekî herêma bi nav Azerbaycan wek parek ji axa Kurdan hatiye naskirin. Ehemd Kesrewî nivîskarê Turk li pirtûka xwe ya bi navê "Şehriyaranê gomnam" dibêje ku pêştir Kurdan li herêma Erdebîlê dewletek bi navê Mosafiryan hebûne ku zêdetir Ji 300 Salî desthilatdarî kirine! Her wisa piraniya navên herêmên Erdebîl û Tevrêzê Kurdî ne. Bo mînak navê Tevrêzê li zaravayê Kurmancî ya bakûrê Kurdistana Îranê bi wateya bajarekî rêk û serber tê. herweha Tavrêj, yan Tevrêz li zmanê Kurdî de tîştekî zaf xûya û diyar e û wateya vê rohn û eşkere ye.

Mezintirîn çiyayên herêma Tevrêzê wek Sehulan (sebelan) ku bi wateya çiyayê bûzê ye, û Sehend ku nawenda hêz û desthilatdariya Rewadiyan bûye navên kurdî hene. Lê dîsan kurdan tucarî negotine ku ev bajar, bajarên kurdanin yan bajarê kurda bûne! Lê sed heyf û mixabîn seba nebûna pîlan û bernameyekî rohn ji aliyê kurdan û bi taybetî hêz û partiyên kurdî roj bi rojê xaka kurdistanê hatiye qetandin û îro rojê me parek mezin ji xaka xwe ya pîroz ji dest daye. Nebûna vê hevdengiyê li nava partiyên kurdî û bêdengiya medyaya kurdî li hemberî pîlanên neyaran, bûye sebeb ku neyarên me bi rihetî pîlanên xwe bidomînin.

Eger em mêzeyî coxrafiya û dîroka herêma Azerbaycana Rojava bikin, xûya ye ku ev herêm hertim xaka Kurdan bûye û Kurd xwediyê sereke yê vê xaka pîroz in. Li praniya van bajaran navên Kurdî û Evêstayî xûya dikin û navê piraniya çiya û cihên din yên herêmê bi kurdî ne. Herwek em dibînin ku navê Makûyê li navê Madan, navê Xoyê ji çiyayên bi "xwê" çêbûyî yên derdora wî bajarî, navê Selmasê li Selemastê anko bi wateya bayê hênik ê sibêdehiyê hatiye wergirtin. Lê pirs ev e ku gelo çima partî û rekxistinên rojhilatê Kurdistanê li hemberî van bajaran bêdengiyê dikin û her car bi hêcetekê li hember pîlanên dujminên Kurdan û neteweya me bêdengiyê dikin? Gelo berjewendiyên hizbî li serweyî berjewendiyên neteweyî ne?

Mixabin kêmtir ji TV û medya'ya kurdî de bas ji nasnameya kurdistanîbûna van bajaran dikin û gelek ji medyayên Kurdî, seba hin berjewendiyên hizbî van bajaran, bi kurdistanî nizanin. Bajarek ku serhildana xanê lepzêrîn, Simkoyê şikak û cihê ji dayîkbûna rêber û serdarê navdarê kurd Dr. Qasimlo ye.

Kurd û partiyên kurdistanî divêt karesata Mûsil û Kerkûkê wek dersekê ji dîroka me wergirin û îznê nedin Urmiye wek Kerkûk û Mûsilê ji nasnameya xwe ya kurdistanî dûr bikeve û parek dinê ji xaka me dîsan ji me bihê wergirtin. Divêt ku em xelkê xwe li kurdistanê ji pîlanên ku li hemberî wan bajaran de hene, haydar bikin û bêşik û guman, medya kurdî dikare rolekî herî berçav hebe. Erkê li ser milê nivîskar û rewşenbîrên neteweya me ye ku li ser nasnameya kurdistanî ya wan bajaran kar bikin û xelkê me bi her awayî ku dibe haydar bikin. Bê guman neteweya kurd bi xaka kurdîstanê netewe ye, û eger em xaka xwe ji dest bidin neteweya me jî ji nav diçe.

www.arsivakurd.org

# Serhejmariyên Welatekî "Îmam Zemanî"



**W: Ceifer Mubeşirniya**

Di vê nivîsarê de emê bi kurtî bas ji pirs, alozî û arîşeyên di nava welatê Îranê de bikin. Bêguman ger em bixwazin serhejmariyek dirust û tewaw ji ewa ku di 32 salên derbazbûyî de li Îranê qewmîne, kom bikin, divêt çend pirtûkan li ser de binivîsin, nemaze serhejmariyên gendeliyên aborî ên dewletî. Lê ewa ku di vê raporê de hatiye, bi mufahsitandin ji çavkaniyan hatiye komkirin.

**Riftar û nerêkiyên cinsî:**

Li gor ragihandinek fermî %15,9 mêrên zigortî û %4,4 ji keçan beriya gihîştin bi temenê 19 saliyê têkiliyên cinsî hebûne.

Di wê ragihandinê de hin ji pirsgirêkên heyî di wê derbarê de bi wî awayê jêrîn e:

1. Dijberîkirina berpirsan li hember mijara hînkirina riftarên saxlem ên cinsî bo ciwanan.
2. Nizimbûna asta perwerdekirina ciwanan bona kuntirolkirina jiyanê.
3. hebûna morala înkarkirinê li hember pirgirêkên ciwanan
4. ciwanbûna civakê û berfirehbûna sîstemên ragihandinî

**Xesarên civakî:**

Hejmara bengdaranl Îranê ji 2 milyon kesan pirr zêdetir e, lê 16 sal e ku ev hejmare dubare dibe û di Tehranê de 400 hezar kesên bengdar hene.

Telaq di Îranê de di sala derbazbûyî de , 17 ji sedî zêde bûye ku Parêzgeha Yezd, zêdetirîn asta telaqê heye.

Navinca girtiyan di cîhanê de, ji her 100 hezar kes, 140 kes in, lê halekê di Îranê de li hember her 100 hezar kesan, 200 kes girtî hene.

Herwiha %30 ji wan serdanên ku bo navendên cur bi cur ên orjansî ên Îranê tên kirin, pêwendî bi azardana jinan, zarokan û kalan hene.

%11 ji jinên xwefiroş ên bajarê Tehranê bi agehdariya hevjiyên xwe dest bi vî karî didin.

Di dehsala 60 û 70'an a rojî de, temenê xwefiroşiyê jordeyî 30 saliyê bû lê niha temenê vî karî gihîştiye serveyî 15 saliyê.

**Hêla feqr û bêkariyê:**

Îro seba pirsa bêkarî, helawsan û jidest derçûna kuntrola pere di bazarê de, serbarê hebûna çavkaniyên zaf ên binerdî di welatî Îranê de, pêtir ji 10 milyon kes di bin hêla feqra "motleq" û pêtir ji 30 milyon kesan di bin hêla feqra navincî de dijîn.

Li gor navenda serhejmariya Îranê %25 ji bêkaran di nava nifşa ciwan de ye.

Li gor ragihandina nawenda bawerpêkirî ên cîhanî, di navbera 180 welatên cîhanê de, Îran ji warê pêkanîna derfetên karî di pileya 143'an de ye.

**Xemokî:**

encama vekolînên Girûpa Civakî a Navenda Lêkolînên Sitratîjîk a Aryayê, bas ji vê hindê dikin ku %30 ji xelkê Tehranê herdem xemok in û %28 ji wan carna şad û gellek caran xemok in.

**Pêwîstiyên xwe xemlandinê "arayişê":**

14 milyon ji jinên Îranê alavên xwe xemlandinê, bikar tînin û Îran di nava welatên derdora xwe de di pileya yekem de ye, bi awayekê ku %29 ji hemû bikarhênerên alavên xwe xemlandinê di devera Rojhelata Navîn ji jinên Îranê pêk tê. Li gor rapora vê çavkaniyê, Îran di warê xerckirina pere ji bo alavên arayêşî di asta cîhanî de, xwediyê pileya sêyem e.

**Jîngeh:**

Niha **1/10** ji axên cîhanê ku ber bi têkçûnê diçin û îdî ji bo cotkariyê nahên bikar anîn, dikevine nava axa Îranê de û ger pêvajoya têkçûna axê di Îranê de bi vî awayî û hankî bilez bidome, di 30 salên pêşerojê de, gişt axa biber û berhemîner a Îranê ji nav diçe.

Di her çirkeyêkê de 360 metra çargoşe ji daristanên Îranê tên wêrankirin. Bi watayek din, di her 5 salan de 1 milyon dunim ji daristanên Îranê ji nav diçin, yanî salane %1/5 ji daristanên vî welatî ji nav diçin.

Di kêleka pîsbûna seqayê nemaze di bajarên mezin de, em tevî pîsbûna av û axê di pirraniya deverên Îranê de berbirû ne. Niha rojane 32 tun û salane 12 milyon tun kirs û keval di Îranê de çê dibe. Ji aliyekê ve her tun kirs û keval 500 lîtir şîreyê "latex" çê dike û her lîtir şîre dikare 4000 lîtrên avê pîs bike. Ev kirs û kevalane dikarin 118 curên nesaxiyan biafirîne.

**Zewac û telaq:**

62383 keç û xortan di temenê 10 heya 14 saliyê de jiyana hevpar pêk anîne, ku hejmara xortan 19293 kes e û keç jî 43090 kes in ku 3600 kes ji wan telaq wergirtine. Pirraniya wan zarokan zewaca bi zorî bi ser wan de haiye sepandin, di halekê de ku zewaca zûdem yek ji mezintirîn pirsgirêkên mirovî û civakî ye.

**Kirîn û firotina bawernameyên xwendinê:**

Kirîn û firotina bawernameyên karnasiya bilind û duktorayê, diyardeyek metirsîdar e ku gefek micid e li ser xwendina bilind û pêşeroj û pêşkevtina giştî a welat, nemaze di warê zanistî û aboriya ve dixe metirsiyê.

Nirxa bawernameya duktorayê 5 milyon tûmen û bawernameya karnasiyê 2 milyon tûmen e.

**Koçkirina mirovên bijarte û xwendewar :**

Îran xwediyê pileya yekem di warê serhejmariya koçkirina mêjiyan di navbera 91 welatên pêşketî û yên di halê pêşketin û geşekirinê ên cîhanê de ye.

Salane nizîk bi 180 hezar xwendevan ji Îranê derdikevin û diçine derveyî welat. Di encama vê helatinê de salane 50 milyard dular pere zirar digîjîe aboriya Îranê. Li gor serhejmariyan, niha pêtir ji 250 hezar endazyar û Pijişkên Îranî û pêtir ji 170 hezar Îranyên xwediyê bawernameya xwendina bilin li Amerîkayê dijîn û li gor serhejmariya fermî a îdareya pasportê, di sala 1387 a rojî de , rojane 2/3 kes ji mirovên xwediyê bawernameya duktorayê, 15 kes ji mirovê xwedî bawernameya karnasiya bilind û sedan kes ji mirovên xwediyê bawernameya karnasî, ji welatê Îranê rewîne.



**Jordeçûna rêjeya bêmînak a sîxekirinê:**

Nizîkê 20 hezar zarokên bênasname di seranserê Îranê de di encama zewaca demkî anku "sîxe" ji dayîk bûne ku bavê pirraniya wan torîst bûne.

Pêka serhejmariyên pejirandî, di rapora Îranê de hatiye ku serhejmariya sîxe di 6 mehên destpêka îsal de, %45 jorde çûye û rewş wiha dide xuyakirin ku diyardeya sîxê hêj ber bi jordeçûnê bimeşe.

**Înternêt:**

Rêjeya nifûza înternêtê di Îranê de %40 kêmtir e ji welatên pêşkevtî.

Îranê tenê 465 hezar bikarînrên înternêta bihêz û bilez heye ku pêka vê hejmarê Îran tu cihek di nava pilebendiya cîhanî de bidest naxe.

Navinca nirxa îternêtê di Îranê de 11 beramberî Turkiyê û 330 beramberî welatê Japonê ye. Ji warê hêz û lezatiya înternetê, Îran di nava welatên cîhanê de xwediyê pileya 176'ê ye.

Îran ji warê navinca lez û hêza întênetê di nava welatên Rojhilata Navîn ên weke Îraq, Turkiye, Îmarat, Kuwêt, Azerbaycan, Pakistan, Erebistana Seodî, pileya herî dawî bidest xistiye.

**Serhejmariya Darvekirinê:**

Sala 2000: 165 kes
Sala 2001: 75 kes
Sala 2002: 3016 kes
Sala 2003: 154 kes
Sala 2004: 108 kes
Sala 2005: 94 kes
Sala 2006: 177 kes
Sala 2007: 317 kes
Sala 2008: 350 kes
Sala 2009: 402 kes

Di sala 2009'an aliyê kêm 5 nûciwan û 13 jin hatin dardarkirin û kesek jî hate ricimkirin.

www.arsivakurd.org

# Boyaxçiyê çav bi giryan

N: Mihemdreza Serwê Dilîr
W: rondik

Bilez gavan hildigrim, serê kûçê pire ji kur û keçên xwendekar ku ji zanîngeha Tehranê derketine. Hin ji wan li ber deriyên pirtûkfiroşiyan sekinîne, desteyek jî li halê meşiyanê de ne. Ez dixwazim pirtûkekê bikrim û berevajî her car ku ji ber bêşoliyan dihatim û min dema xwe diborand, vê carê nedibû ku li ser hemda xwe bimeşim û demê biqedînim. Ji nişkîve dengê zarokekê, viyan û îradeya meşiyanê ji min stand û neçar bûm ku bisekinim. Jiyê kurik ji 10 – 11 salan pêtir nebû. Bi dîtina rûçikê çirmisî û kincên pîs û pintû yên wî, min texmîn kir ku ji zarokên ser şeqaman be, zarokên bê serperist ku bi sedan ji wan li wî bajarê bidoman, bidûkel û girtî de, xewn û xweziyên xwe li nav tirombêlan de bicî dihêlin, hêviyên wan jî li nav golmekên cokan de bizir dibin û rondikên wan jî li ser asfalta tezî a peyarewan de dicemidin. Zarokên ku taba birçîtiya zêde nakin û ji ber vê tawanê, wan diz dihesibînin, kargeh kar nadin wan û ger wekî karker jî werbigrin heqdestê wan nadin û ...

Li dîtina yekem de qey tu dibêjî kurik jî yek ji wan zarokan e ku ji bo balkişandina xelkê digrîn, direwan dikin û pere distînin. Li rex wî rûdinêm "çima digrî?" çi qewimiye? vê carê jî bi heman dengê girtî dibêje "şarevaniyê boyaxên min birin". Ciwanek jê dipirse "kuro pere dixwazî"? Kurik tiştekê nabêje û xortê ciwan ku bêdengiya wî bo rezameniyê veguhastibû, jêre got: "Ger rast dibêjî ka destên xwe nîşan bide û ger tu boyaxçî bî, destên te wê reş bin".

Kurik bi morala wî ket û got: "Te çi kar bi destên min heye?"

Xortê ciwan ê bextewer ku bûna zarokên wusa li şeqamên bajarê xwe de naxwaze, dibêje "tif li rûyê te" û biliz dûr dikewe.

Xwîna min dikele û dixwazim pêsîr û berçêla bexteweriya wî bigrim û bidirrînim û bi ser de biqêrînim ger tu hevkariya wî



nakî, aliyê kêm moral û deiya wî binpê neke.

Lê ew çûbû, xal û pinîkên reş li ser kirasê wî nîşan ji rastbêjiya wî dikin. Dixwazim dildariyan bidim ber dilê wî û wî dilxweş bikim û li cihê ew xortê ciwan lêborînê jê bixwazim, lê ew ku pir hêrs û xembar bibû, bi girî ve dûr diket. Dengê giriya wî eslen naşibe girîna zarokên Tehranî, kelogîriyê ketiye, girtiye û dikele, qey tu dibêjî qirika wî birîndar bûye, Xwedêyo çi bikim? Dûre biçim? Yan jêre alavên boyaxçîtiyê bistînim? Bi kîjan pere? Min jî ferqek wusa bi wî re nine.

Ev jî birînek li ser birînên bêderman yên din! Kurik ji ku hatibû? Serperist û bijîvhînerê çend kesan e? Diya kal û nesax li bendê ye yan bavê bengdar û motad? Xûşka seqet li bendê ye yan birayê birçî? Nizanim. Lê her çi be, wî dixwast bişoxole û bi destên biçûk yên xwe ku ji ber sirr û sermayê şeq şeq û tîk tîk bûne, nanek helal bidest bixe. Dixwast diziyê neke, xazokiyê neke, dixwast...

Lê îşev divêt destvala, betal û bi çavên pindifî vegere malê û ji sibê ve li hizra karek din de be ku karmendên şarevaniyê nekarin kel û pelên wî bi xwe lê bistînin!

Dikevim bîra sukur stûrên ku çend pêngavan şûndatir, li derdora meydana Înqilabê de li ber guhên rêvîngan de diçipandin kasetên şad yên davetan, fîlm, pasor, wêne û ...hwd. Wan jî kasibî dikir, lê karmendên şarevaniyê tu karek bi wan nebûn. Rewşa wan pir baş e, hin ji wan jî bi bîr dixin ku rojek ji rojan karê boyaxçîtiyê kirine...

## Li Middle Tennessee State Universityê dersê Kurdî destpê kir

Li Middle Tennessee State Universityê dersên Kurdî destpê kirin. Di hevpeyvîna Pişka Kurdî a Dengê Amerîka de zimanzan Denîz Ekîcî, li ser destpêkirina dersên Kurdî li Zanîngeha Middle Tennessee State Universityê dipeyîve.

Ekîcî dibêje, ji civata Kurdî ya Nashvillê û taybetî jî ji xortan coşeke mezin heye û heta niha 20 xwendekar serîledana bernamê kirine.

Denîz Ekîcî her wiha dibêje, ew hêvî dike ku hem bi alîkarîya Hikûmeta Herêma Kurdistanê û saziyên din yên Kurdan ew dê di demeke nêzîk de enstîtuyeke Kurdî vekin.

MIDDLE TENNESSEE STATE UNIVERSITY

Kaniya Helbestan

## Bendewarî



### Xunav

Ji nû ve çavên min li riya te diçirûsin,
Xwezî mûmek bama .
Da ku riya xewnên te ronahî bikira
Tenê xunavên şevinî di hişê min de dimeyin
Hûr hûr, li pencera dil didin.
Tenê ez û sawîrên xwe,
di nav rûpelan de digerin.
Sorgul bi dûriya te stûxwar dibin
wêneyê te li çar goşeyên odeya min semayê dike
Bêhna te dever tijî bêrîkirin kiriye,
Mîna gulên li ber xunava êvarê,
Mişextiya balendeyên ku bêriya germiyanan dikin.
Pêl dibêje derya êvîndar im
Xunav dibêje gulan sozdar im
Heyv dibêje stêrkan dilxwaz im
Çav li te digerin dildaro
Vîna te bo min roşeng e
hêviyên te di giyan de sûlav in.

www.arsivakurd.org

agiri

**Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne**

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:**
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail: agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com**




## Romanî: Di şerê dijî rejîma Komara Îslamî de em li kêleka Îsraîlê ne



Ligor ragihandina Meşriqê, Tirayan Basîsko, Serokkomarê Romanya li gotûbêjekê de ragihand ku di dema şer li dijî Îranê de emê piştevanî ji Tilavîv û Natoyê bikin.

Wî hêvî xwest ku pirsa di navbera Îran û civaka cîhanî bi riya dîplomatîk û urpêçan ve bihê çareser kirin.

Basîsko di seredana Şîmon Pirêz bo Romaniyayê got: hêvî dikim durpêçên ku ji aliyê Şêvra Ewlehiyê li dijî Îranê hatne pesendkirin, baştirîn rêçare be, nek ew qebrên ku Îranê bo leşkeriyên Amerîkayê kulîne.

Ligel wê yekê, Ertêşa Îsraîlê pirraniya manorên û piroveyên nîzamî yên xwe di Romaniyayê de birêve birin ku armanca birêvebirina wê, êrîş bo ser Îranê hatiye navkirin.

## Yekem jina Kurd çû ser bilindahiya çiyayê Hîmaliyayê



Yekem jina Kurd a bajarê Mehabda Rojhilatê Kurdistanê bi navê Beyane Fazilî çû ser bilindahiya çiyayê Hîmaliyayê. Beyane Fazilî, keçek 23 salî a bajarê Mehabadê ye û ji malbateke werzişvan ji dayîk bûye. Fazilî endama Civata Alîgirên Hewraz a Mehabadê ye. Civata Hewraz li ser navê çiyavanê navdar ê Rojhilatê Kurdistanê Mihemed Hewraz hatiye avakirin ku navbirî sala 2003 an li çiyayê Hîmaliyayê jiyana xwe ji dest da.

Rojnameya Rûdaw ragihand, ku eva 8 sal e Beyane Fazilî werzişa çiyavaniyê dike û 4 sal dibe bi awayekî pîşeyî vê werzişê dimeşîne. Beyane 18 ê Tîrmeha 2010'an ligel girûpek din a çiyavanan bo Hîmalîyayê hat şandin û karîbû bigihîje bilindahiya "Nan Pick" a ku 7 hezar û 135 metran bilind e. Rojevakurd.

## Xwînxwarên rejîma Îranê, zimanê girtiyekî kurd birrîn



Ligor ragihandinan, xwînmijên girtîgeha Êvînê, zimanê Metîn Ercan, girtiyê siyasî yê xelkê Kurdistana Turkiyê di dema îşkencê de birîn û niha ew di rewşek pirr xirab de ye.

Nûçegihaniya Diclê ragihand ku Metîn Ercan xelkê bajarê Batmana bakûrê Kurdistanê ye û di heyamê du salên derbazbûyî de di girtîgeha Êvînê de du caran tûşî sekteya mêjî bûye û di herdu caran de jî siqet bûye. Zekî Ercan birayê Metîn ev nûçeye piştrakir û got ez heya niha 4 caran çûme Îranê û min birayê xwe dîtiye û ew pirraniya dema xwe di bin îşkencan de ye û di bendên takekesî de ye.

Niha ku birayê min di halê mirinê de ye, rejîmê 27 milyon tûmenan ji min sitandin ku birayê min serbest berdin, lê ne tenê ew bernedan, belkî gef ji min jî xwarin ku ger Îranê bi cih nehêlim ewa ez dê ligel mirinê berbirû bim.

## Baştirîn welatên cîhanê



Kovara Emerîkî a ''Newsweek'', lîsteya baştirîn welatên cîhanê li warê rewşa perwerdehî, tendurustî, aborî û ramyarî ve belav kir.

Li gor vê lêkolînê, Finlenda yekemîn welatê cîhanê ye ku kuwalîteya jiyanê di hemû waran de lê bilind e. Duyem û Sêyem, Swêsra û Swêd in. piştre Australya, Luksemburg û Norwej tên. Holenda li refa 8'emîn de baştirîn welat e. Lê di warê wekheviya homoseksuelan de ew yekemîn welat e, li gor Newsweek.

Di top 10 de 7 welatên Ewropî û Australia, Kendeda û Japon in.

Li jêr lîstê Sûriye cihê 83emîn e. Skorên wê di her warî de kêm in. Bi giştî temenê Sûriyan dighêje 63 sal û hejmara bêkaran 16,6% e. Di warê azadiyan û hevpariya ramyarî de 6.5 (7 a herî kêm e).

Kwalîteya jiyanê li Îranê û Kûbayê jê bilndtir derket, (79 û 50) li gor Newsweek.

www.arsivakurd.org